

JAG  
VILL  
VETA

EZ DIXWAZIM BIZANIM  
LISER ZARROKETÎ Û  
JÎYANA BI AGAHÎYËN  
ŞËXSÎ YÊ YÊ PARASTÎ

[www.jagvillveta.se](http://www.jagvillveta.se)



Ev belavoke ji bo zarrokên ku bi agahîyên şexsî yê parastî dijîn hatiye berhev kirin. Ev belavoke bi hevparî ya Brottsoffermyndigheten û Barnombudsmannen hatiye berhev kirin. Ev agahîyane ligor serpêhatîyên zarrokên ku bi agahîyên şexsî yê parastî dijîn hatiye berhev kirin. Di ev belavokê da gotinên jêwergiran ji rapora Barnombudsmannens hatine iqtibas kirin.

Bi nêrîna malpera **www.jagvillveta.se** hûn diakirin agahîyên bêhtir liser tawan, bertek û piştgirî û parastina di ev babetê da bidest bînin.

U Švedskoj viŝe od 4 000 djece i mladih živi sa zaštićenim ličnim podacima. Mnoga od ove djece i mladih, ili neko iz njihovih porodica, bili su izloženi opasnosti ili zlostavljanju. Opasnost obično predstavlja neko od članova porodice, na primjer tata, očuh, mama ili drugi članovi porodice., mamma eller andra släktingar.

## AGAHÎYÊN ŞEXSÎ YÊ PARASTÎ DIBE SEDEME EWLEHA KESÎ

Mafê gişt zarroka ne ku bê tirs û metirsî bijîn. Agahîyên şexsî yê parastî ev mijarê piştrast dike ku zarrok û kêmsalê ku rastî şidetê hatine, êdî hest bi ewlehîyê biken û ji bo dubare nebûne ev bûyerane têne parastin.

**»EZ BI HEBÛNA KESAYETÎYA PARASTÎ, HEST BI PIŞTGRÎYEK BILIND DIKEM. DI RASTÎ DA EZ XWE EWLEH DIZANIM. HEST BI JÎYANA EWLEH TECRÛBEYEK PIR XWEŞE«**

Rebecka

# HIN ZARROK Û KÊMSAL DI BICÎ HÊLANA MALBATA XWE DA MECBÛRRIN

Pirana zarokê ku ketine bin parastina agahîyê şexsî herîkêm gel yek ji dêûbavê xwe dijiîn, lê hin kes hene ku mecbûrrin bi giştî malbata xwe bicî bêlin. Di rewşek wisa da, ev gel malbatek di dijiîn. Ev malbata, avahîyên xwedî kirina zarokên bêxwedî binav diken

## Agahîyê şexsî yê parastî bi sê cûre ne.

Parastina ku tê were bê pêşkêş kirin girêdayî ye bi asata metirsîya ser ser we.

**1. Şexsî ragirtina agahîyan.** Eger hûn li gor ev rêzeyê hatibine parastin, tenê dibistan, ximzetkerên saxlemîyê, xizmetkerên civakî û hinek rêxistinê di ku liser nehîna mana nîşanî û telefona kesan pir bixemin, izna berdest bûna agahîyên we yê şexsî hene. Şexsî ragirtina agahîyan hersal tete venêrîn kirin.

**2. Berdewam bûna qeyd kirina agahîyan.** Di demek wisa da, nîşanîyên we yê nû di çî belavokên da nayên qeyd kirin û tenê tê rêxistina baçê ji nîşanîya we ya rast agadar be. - pêvajoya berdewam bûna qeyd kirina agahîyan du sal carek tê venêrîn kirin.

**3. Agahîyên şexsî yê qelp.** Ti rewşek wisa da hûn bibine xwedî kesayetîyek nû. Bi gotinek di, nav û hejmara nasnameyek nû tê ji were bê pêşkêş kirin. Eve asta herî bilind ya parastinê ye ku gengaze ji kesek re bê dabîn kirin.



# ANKU DESTPÊKA JÎYANEK NÛ

## **Di debistana nû da tê kê agadarî ev agahîya min bin?**

Di debistana nû da, rêveberê dibistanê her-tim agadare ku hûn di bin parastinê da ne. Di vê demê da hûn û rêveberê dibistanê tê biryar bigrin ku çi kesek dî pêdivîye ku liser ev mijarê agadar bin. Hin caran tenê rêveber û mamostayê dibistanê agadarî ev mijarê dibin û hin caran kesen dî jî hene ku agadarî ev mijara ne dibin.

## **Eger kesek pirs bike ez çi bersiv bidem?**

Zarrokan ev maf hene ku sedema parastî bûna agahîyên xwe yê çexsî bizanin û ji kesê mezin

sal ku izna gotina ev mijarê ji wan re hatîye pêşkêş kirin alîkarî wer bigrin û bizanin ku dema pirsan çi bersiv biden. Pirsên asteng eve ne, pêştir ve li kû dijît, çima tû hatûçûna dêûbavê xwe yê nehîni nakî, anku çima dêûbavê te pişk-darîya lîsteya sinifê yan wêneya giştî naken.

## **Gotina hinek ev agahîyane, bê metirsî ye**


Divê ku hinek agahîyê nehînin bimînin lê vegotina hinek ev agahîyane, bê metirsî ye. Eger hûn qet liser xwe neaxivin eve dibe sedem ku ji bo xelkê pirs saz bibin û bibe sedena zêde bûna pirsan. Ji ber vê, vegotina hindêk mijaran liser xwe, dibe ku bi mifa be.

Ger hûn bixwazin liser malbata ku hûn gel dijîn û liser cihê ku lê hatine tîstek biaxivin, erênî ye. Ger gotina hemû endamê malbatê yek be, rîska asteng bûnê kêm dibe. Herwisa bersiva pirsê ger hûn pêştir liser fikirî bin, asantir dibe.

## Hebûna agahîyê parastî, mijarek dijware.

Dema ku hûn bi agahîyên parastî dijîn û nikarin nav û cihê jîyana xwe ya rast bêjin, gelek mijarên asa aloz dibin. Bo mînak, beşdarîya xebatên bêvedanê, bikar anîna torên civakî, kirîna amûran ji tora înternetê, çûna pey karek dî anku hebûnba karta endametîya pirtûkxanê, dibe mijarek dijwar . Herwisa dibe ku hişyar bin ku nekevîna nava wêne ya û liser xwe agahîyên berfireh nedin.

Gelek ji zarrok û kêmsalê ku bi agahîyên parastî dijîn tûşî nerihetîya tenêbûnê dibin. Gengaze dema ku hûn nikarin liser cihê jîyana xwe anku navê xwe yê rast biaxivin, ev hest bê ve ku hûn lêba diken yan derev dibêjin Dema ku hûn nikarin bi rastî liser xwe agahîyan biden, hebûna hevalên nêzîk anku kesek ku bikare ji were alîkar be, dibe mijarek dijwar.



**»EZ HEZ NAKEM KU GELEK DEMÊ GEL HEVALÊN XWE DERBAS KEM LIBER KU NAXWAZIM PIRSAN JI MIN BIKEN. EVE GELEK LISER MIN BIBANDORE.«**

**Sofia**



## **Gelo bi agahîyên parastî mezin bû ye?**

Gelek zarrok û kêmsal her li maweya biçûkatîyê bi agahîyên parastî mezin dibin. Û ji ber vê nizanin ku çima agahîyê wan hatine parastin. Herwisa gengaze dema ku zarok mezin dibin û ji sedema parastî bûna xwe agadar dibin, mezin jî ji têgehîştina ev mijarê tûşî dijwarîyê bibin. Bi giştî kesê mezin liser ev mijarê agadr nînin ku di dibistanê da, li maweya bêvedan anku derbaskirina demê gel hevalan, eger hûn xwedîyê agahîyên parastî bin, hûn rastî çî astengîya tên.


Her kesê ku xwedîyê agahîyên parastîye û dixwaze sedema vê bizane, gengaze jî kesek mezinsal bipirse ku ji mijarê agadare . Eger mezinsalê ku hûn gel dijîn, agadarî ev mijarê nîne, hûn dikarin ji mezinsalê dî bipirsin. Dibistan, xizmetkerê civakî anku polîs dikare alîkarîya we bike û bersiva ev pirsane biden.

## Rênasîyên pêşkêş bûyî liser kesên kêmsal (ku ji rapora Barnombudsmannens hatine vegirtin)

- Izin nêdên ku »kesayeta parastî« jîyana we asteng bike. Hûn gelek binirxin!
- hertim ji mezinek, bixwazin ku gel we were dema ku hûn dixwazin biçine nexweşxaneyê. Xênjî vê dibe ku hûn rûnênin û agahîyên pêdivî pêş ku êşa we were çareser kirin, ji hemşîre re pêşkêş biken.
- Berî ku perwerdeya we di debistanek nû da destpê bike anku taxa we bê guhertin, gel malbata xwe liser çawanîya gotina çîroka jîyana xwe, amadekarîyê xwe biken Tîştê ku hemû endamê malbatê tê ser rawestî, peyda bikin. Di xênjî vê, zû yan derneq tê xelk bizane ku we lêb kirîye û hertim tê pîrsa ji we bipîrsin.
- bernava bikar bînin (...). Di vê demê da tê hertişt asantir bibe.
- bêhle ku ez bizanim! Mifaya mezina ji were heye û ev zîyana ve xira naken!

# WWW.JAGVILLVETA.SE

Bi nêrîna malpera [www.jagvillveta.se](http://www.jagvillveta.se) hûn diakrin agahîyên bêhtir liser mijarên taybet bu tawanên cûda, wergirtina piştgirîya û dema ketina nava tawanekê da tê hesta we çawa be, bidest bixin. Herwisa di ev malperê da, serpêhatî û pêşniyarê zarrokên dî ku bi agahîyên şexsî yê parastî dijîn hatine berhev kirin.



## **BROTTSOFFERMYNDIGHETEN**

Box 470, 901 09 Umeå

Telfon: 090-70 82 00

[registrator@brottsoffermyndigheten.se](mailto:registrator@brottsoffermyndigheten.se)

[www.brottsoffermyndigheten.se](http://www.brottsoffermyndigheten.se)

[www.rattegangsskolan.se](http://www.rattegangsskolan.se)

[www.jagvillveta.se](http://www.jagvillveta.se)